



T Ê K O Ş E R



HEJMAR 32

HEZÎRAN 1986



revue trimestrielle

driemaandelijks blad

TEKOŞER: KOVARA TEKOSER, YEKITIYA KARKER U XWENDEKAREN KURD LI BELÇİKA

NAVNIŞAN: B.P. 33 - 1730 ZELLIK - BELGIQUE

BUHA: 40 F.B., 2 DM, 6 FF.

N° BANKE: 426-3144071-85 - K.B. - BELGIQUE

BERPIRSIYAR: M. Nezh YALÇIN

KOMİTA NIVİSKARIYÊ: Ahmed, Derwêş, Pervîn, Yalçin

N A V E R O K

KURD LI EWRUPA	Pervîn	R. 3
REZIMANA KURDÎ (V): Dengdar ...	Celadet BEDIR XAN û Roger LESCOT	R. 4
AXAFTINEK: KURDISTANA TIRKIYE	Şerafettin KAYA	R. 9
DAREN KURDISTANE	YALÇIN	R.10
DÎROKA KURDISTANÊ DI ANSİKLOPEDIYA ISLAMÊ DE (V)		R.12
ALİKARIYA CIVAKA BIYANIYAN (III)	Derwêş	R.16
ÇİROK: GUROSO	Mihdî	R.17
ZIMANÊ KURDÎ (I)	Fuad HAMA XORŞİD	R.18
XEBATA ME		R.22
TEKOŞER'DEN HABERLER		R.23

S O M M A I R E

LES KURDES EN EUROPE	Pervîn	P. 3
GRAMMAIRE KURDE (V): les consonnes ..	C. BEDIR XAN et R. LESCOT ...	P. 4
CONFERENCE: KURDISTAN DE TURQUIE	Şerafettin KAYA	P. 9
LES ARBRES DU KURDISTAN	YALÇIN	P.10
L'HISTOIRE DU KURDISTAN DANS L'ENCYCLOPEDIE DE L'ISLAM (V)		P.12
L'AIDE SOCIALE AUX IMMIGRES (III)	Derwêş	P.16
CONTE: TÊTES RASEES	Mihdî	P.17
LANGUE KURDE (I): origine et spécificité ..	Fuad HAMA XORŞİD	P.18
NOS ACTIVITES TRIMESTRIELLES		P.22

KURD LI EWRUPA

Pervîn

Di hejmara buhurî de ez li ser astengên (bi tirkî: Engel) yekîtiya Kurdan peyivî bûm. Nuha jî, ez dîtina xwe bi kurtî li ser rewşa Kurdan li Ewropa dibêjim.

Berê çend salan min bawer dikir ku ji sedema hin serbestî û alîkariyên ku hikûmet û rêxistinên ewrupî didin me ewê Kurd karibin li Ewropa gelek tiştan bikin. Lê mixabin, hêdî hêdî min dît ku hin tişt li vira çêbibin jî, xebat li Ewropa ji Kurdistanê gelek diwartir e! Ji bo ku dema ku meriv ne li ser axa xwe be ji koka xwe vediqete û dibe weka gul yan dara ku ji rihên xwe tê jêkirin û di cihekî dûr û cihê de tê çikandin. Ango, meriv bi vî awayî jînyariya xwe hunda dike û di civaka biyanî de cihê xwe yê xwederî (tebîî) nastîne.

Ne pêwist e ku ez li vê derê li ser pirsên maddî û manewî, ku her biyaniyekî qels dikin yan hildiweşînin, rawestim. Li ser vê babetê me û Kurdên din nivîsiye. Ezê bitenê li ser kartêkirina (tesîr) biyaniyeyê li ser xebata Kurdan çend gotinan bêjim.

Kurdên ku nuh ji Kurdistanê tînin, di destpêkê de û ji sedemên ku me li jor gotin li riya xwe digerin. Hêdî hêdî, ew dibînin ku awayên xebatê ji yê Kurdistanê gelek cihê ne. Ji alîkî li vira bêtir serbestî heye, lê ji alîkî din jî Kurd nikarin bi hêsanî bigihêjin hevdu, ji bo ku ev serbestî, weka kêra ku her du aliyên wê tûj in, aliyê wê yê baş û yê ne baş jî heye. Serbestiya raman (fikir), peyv û tevgerê ferzend (firset) dide ku meriv gelek tiştan hîn bibe, xwe bigihîne, zihniyeta xwe fireh bike û li gora qabiliyeta û hêza xwe ji bo pirsê kurdî bixebite.

Lê mixabin, dêmokrasiya rojavayî "serbestiyeke" din a bê sînor û xapînox jî li

ber çavan radixe. Vexwarin, jin, film û weşanên cinsî, qumar û jîna rehet gelek xortên kurd, bi hêzanî yê ku ji gund û bajarên piçûk hatine, di pasîfîzmê de dihêlin.

Astengên din jî ev in:

- a) Em ne di civaka kurdî de ne û li welatên Rojavayê yê cihê belav bûne û ji hevdu dûr in.
- b) Em ji perçe, navçe, gund û bajarên Kurdistanê yê cihê hatine.
- c) Di piraniya van welatên Rojavayê de û li Emerîka, Australia, Canada.... jimara me hindik e û em di nav van welatan bixwe de jî belav bûne navçeyên cihê. Ji derveyî Newroz û hin cêjn û şevan, ne hêsan e ku em bigihêjin hevdu.
- d) Pirsên maddî û manewî, bêrîkirina welêt, ne baş zanîna ziman û zihniyeta rojavayîyan jînyariya me dide hunda kirin.
- e) Ronakbîrên me, ji aliyê zihniyeta û tevgera xwe, ji karker û kesên nexwenda dûr in. Bi ser de jî, dubendiyên ku di nav van ronakbîran de çêdibin xebata hevrayî radiwestînin yan giran dikin.

Ji bo hemî van sedeman em li gora berna-meke kûr û dirêj naçin. Ango, em xebata rojane ji ya herdemî cihê nakin û gelek caran em hêza xwe ji bo tiştên piçûk belav dikin û karê giringtir ji bîr dikin. Dema ku em xebata xwe bê dîsîplîn û bê koordînasyon dikin, piştî zemanê kurt dilê me pê teng dibe û em jê diwestin.

Ez hêvî dikim ku neweyê (nesl) wêbê karibe ji me çêtir vî barê giran hilîne ser milên xwe û bi saya xwendin û tecrubê kêmasî û çewtiyên me ji nuh de neke.

R Ê Z Î M A N A K U R D Î

(Z a r a v ê K u r m a n c î)

- V -

Mîr Celadet BEDIR XAN û R. LESCOT (*)

C. P Ê Ş E Z M A N Î

41. Ç û C- Nîvgirtiyên xîşikî. Tu taybetiya (xusûsiyet) wan a giring tu neye.

42. Ş- Fîkîna kerr. Carna weka "j" bideng dibe:

a) Gava ku dibe weka dawîneya beşa yekemîn a gotineke hevedudanî.

Nîşe: "Şejderb" dêlva "şeşderb" (tabanca)

"Hejdeh yan hijdeh" dêlva "heştdeh"

b) Di gotinên biyanîyên ku ketine nav kurdî de.

Nîşe: Mijûl (ji erebî: meşxûl مشغول).

43. Fîkîna bideng. Di ranîmayê (1) de, "j"ya kurdî dêlva dengên jêrîn ên îraniya kevn tê:

a) Dêlva "c", ku bi farisî dibe "z".

Nîşe: Jin (avista: Canay-, farisî: زن).

Jîn (farisiya kevn: cîva-, farisî: زندگى).

Jîr (avista: Cîra-, farisî: زيرك).

Dirêj (avista: Drâch-, far.: دراز).

Jentin "lêxistin" (av.: Cana-, far: زدن).

b) Dêlva "ç", ku ew jî bi farisî dibe "z".

Nîşe: Ji (av.: Haça, far.: اچ).

Roj (av.: Raoçah-, far.: روز).

Bêje (av.: Vaçah-).

c) Dêlva "z", ku bi farisî dajo (dewam dike).

Nîşe: Jî (av.: Zî).

Mejî (av.: Mazga-, far.: مغز).

Weka hergav, dumilî, ku ji kurmancî bêtir nêzîkî îraniya kevn e, di gelek gotinên ku li jor hatin nîşan dan dengdarên rayî (eslî) dihêle.

Nîşe: Zî (kurmancî: Jî).

Cin (kurmancî: Jin).

Lê, di gelek rewşine din de, di dumilî, weka di kurmancî de, "j" xuya dibe.

Nîşank I. Bê gûman, ji sedema hebûna teşeya (awa) "zî" (bi kurmancî: Jî), ku Dumilî gava ku bi kurmancî jî dipeyivin bi kar tînin, ew bi awakî giştî bi navê henekê "zaza" tên nîşan dan.

Bi soranî, carna "l" dêlva "j"ya kurmancî tê gotin. Nîşe: Bilê (kurmancî: bêje) Le (kurmancî: ji).

Nîşank II. Kurdên Başûrê navê welatîyên xwe yên ku bi kurmancî dipeyivin "Kurdên Jiyan" dikin, dibe ku ji sedema ku evên dawîn, dêlva "l", "j" dibêjin. Ecêb e ku teşeyeke "li" di kurmanciya navçeya Malatyê de, anga nêzîkî hezar kîlometre li Rojavaya Bakurê Suleymaniyê, tê dîtin.

44. Ketina (hundabûna) "j" pirr kêr e. Ew bitenê di çend gotinên ku bikaranîna wan gelek dûbare ye (gelek caran tekrar dibe), weka "roj" ku "ro" jî tê gotin. Ev ketin digihêje daçeka "ji" jî, gava ku ew bi gotina ku berê wê tê xwe radigire.

Nîşe: "Hejî te dikim" dêlva "hej ji te dikim".

(*) Grammaire Kurde, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris 1970. Wergerandin, fransizî-kurdî: Pervîn.

(1) Ranîma (bi fransizî: étymologie): Zanistiya guhertina gotinan li gora awayên wan yên kevn.

45. Y- Nîvdengdêr. Weka ku em pê dizanin, "y" weka dengdara girêdana ahengî di navbera gotinên ku bi "a", "ê", "î", "e" diqedin û nîşanên ku distînin de, gava ku ev nîşan bi dengdêran dest pê dikin, bi kar tê. Bikaranîna wê piştî "o" û "u", di vê rewşê bixwe de, bitenê di çend navçeyan de dibe. Rêzikên (qaide) vê bikaranîna "y" di bendên 15, 16, 18 û 19 de hatin nîşan dan.

"Y" pirr kêm caran weka regezêkî (unsur) pêkanîna rayên kurdî xuya dibe. Sedema hebûna wê di hundirê gotinan de, piraniya

caran, ew e ku du dengdêr di dû hevdu de neyên.

Nîşe: Payîz, dayîn, heyîn, neyîn, mayîn.

Gotinên ku bi "y" dest pê dikin, jimara wan nêzikî pêncî bitenê ye: Nîvên wan rakişandinên "yek" in, û ji çarîkê wan bêtir ji zimanên biyanî, ku bi awakî istisnaf teşeyên xwe yên kevn hiştine, hatiye stendin. Bi rastî, piraniya gotinên biyanî, ku tê de "y" a pêşîn (a destpêka gotin) hebû, gava ku ketin nav kurdî vê dengdarê hunda kir; bi vî awayî, sernavê erebî "Yûsuf" یوسف bû "Ûsif" (Ûsif, di hin navçeyan de).

D. E Z M A N Î Û Q I R I K Î

46. K- Girtiya kerr. Balkêş ku "k", di jimareke gelek piçûk a gotinan de, weka "ker" (merivê ku nabihîse) û "kir" (serê komeke kevirî), ji yên xwederî (tebîî) hişktir tê bi lêv kirin.

Xuya ye ku sedema hebûna vê cihêtiya piçûk xwestina cihêkirina hevdengên (2) mumkun e. Bi rastî, gotinên "ker" û "kir", gava ku bi "k" yeke xwederî tîbî lêv kirin, rêzayê wan dibe "ker" (lawir) û "wî kir" (lêkera kirin). Li dûrtir (bend 51) emê nîşeyên din ên ku nîşan didin ku ev ziman dixwaze tevliheviyên weha dût bixîne darîçav bikin.

Nîşank I: Ji sedema kêmbûna wê, ev taybetiya (xusûsiyet) fonêtîk ku me nuha nîşan da di alfabe ya latînî de ne hat danîn, û her du "k", ya nerm (xwederî) û hişk, bi eynî tîp tîbî nivîsîn: Kurdên Erîvanê, di alfabe ya xwe ya pêşîn de, ji her yek ji wan re tîpeke taybetî hiştî bû, lê ev cihêtiyê bê derengî ji nivîsînê hunda bû.

Qenc e em bînin bîra we ku Ziya Ed-Dîn Paşa, di ferhenga xwe ya kurdî-erebî de, ku navê wê Hediyyet Hamîdiyye bû (Istanbul, 1310 H.) û ku ji bo wê heyamê (dem) xebateke berbiçav bû, vê cihêtiya piçûk nîşan da bû: Ew di rûpel 208 de dinivîse: "Ker" (lawir), "ker" (bi "k" yeke hişk: merivê ku nabihîse), "ker" (amade, hazir), "ker" yan "kerî" (perçe). Kurd vê gotinê, li gora rêzayê wê, bi cihêtiyên sivik, ku biyanî bi zorê pê hest dike (dihese) û ku nabe ku li vira bînin nivîsîn, bi lêv dikin".

Nîşank II: Balkêş e ku di nîşeyên jorîn de (ker "ê" ku nabihîse) û (kir "serê komeke kevirî"), "r" jî ji ya xwederî xurttir e (li bend 36 binêre).

47. Ketina "k" di dawiya gotinan de dúbare ye (gelek caran dibe).

Nîşe: "Serşo" dêlva "serşok" (hemam).

"Berbû" dêlva "berbûk" (kortêja ku bi bûkê re diçe)


Di destpêka gotinan de, "k" carna bideng dibe û "g" tê bi lêv kirin.

Nîşe: "Go" dêlva "ko" (ku).

"Goçer" dêlva "koçer".

"Gopal" dêlva "kopal" (dar).

Li ser guhertina "k-g" li benda jêrîn binêre.



(2) Hevdeng (bi fransîzî: Homonyme): Gotinên ku bilêvkirina wan weka hev e, lê ku rêzayê (mana) wan cihê ye: Mal (xanî), mal (hebûn).

48. G- Girtiya bideng. Baş e meriv bala xwe bide dúbareyiya tofa (kom) "-ng", di dawiya gotinan de.

Nîşe: Deng, reng, çeng, zîving (şkefta ku meriv tê de dijî), quling û hwd.

Dengdarên "g" û "k" gelek caran cihê hevdu digirin.

Nîşe: "Pûnk" û "pûng" (naneya hov).

"Rizyang" û "rizyanik" (celebeke gihayê pirr zirav".

"Zarong" û "zarok".

"Çong" û "çok".

"Brang" û "brak" (bira).

"Mang" û "mak" (dê).

"Belk" dêlva "belg" (pelik).

49. Q- Pêşezmanî, girtiya kerr. Ev dengdar bi hêzanî di gotinên ku ji zimanên ne îranî hatine stendin tê dîtîn. Li gel vê qasê, ew di gotinên ji rayê îranî de jî, lê kêmtir, xuya dibe.

50. X- Paşezmanî, ajotiya kerr. Ji derveyî bikaranîna wê di gotinên ku ew tê de bi awakî xwederî peyda dibe, "x", di çend peyvikan de, dibe "x"ya rayên îranî yan a gotinên biyanîyên ku ketine nav kurdî.

Nîşe: "Bexçe" dêlva "beḫçe" (farisî: باغچه).

"Kaxez" dêlva "kaḫez" (farisî: کاغذ).

"Xulam" dêlva "xulam" (erebî: خلام).

"Axa" dêlva "axa" (tirkî: آغا).

"Xerîbî" dêlva "xerîbî" (erebî: غریب).

û hwd.

"X" gelek caran cihê "q" ق ya gotinên ku ji tirkî yan ji erebî hatine stendin digire

Nîşe: Nexş (bi erebî: نقش).

Yasax (qedexe) (tirkî: yasak ياساق).

Next (qelen) (erebî: نقد).

Ancax (tirkî: ancak; آنچاق).

Qayix (tirkî: kayik; قایق).

51. X- Paşezmanî, ajotiya bideng. Weka ku me li jor dît, bikaranîna vê dengdarê dúbare be jî, ne her gav giştî ye. Jixwe îro ew pirr caran bi "x" tê guhertin. Loma, me nîşeyên benda jorîn darîçav kirin (bexçe, kaxez, xulam, axa, xerîbî).

52. H- Ajotiya bideng. Lêhûrnêrîna rola vê dengdarê balkêşîyeke taybetî dide xuya kirin; ew, bi rastî, ferzend (firset) dide ku du merheleyên taybetîtirîn ên pêşveçûna fonêtîka kurdî bîn danîn. A yekemîn bi giringîya mezin a "h" ku cihê gelek dengên îranîyên kevn stendiye, û a duyemîn bi

hilanîna pileyî (derece derece, hêdî hêdî) ya vî dengî hatiye nasîn.

1- Guhertina dengdarên îranîyên kevn bi "h".

a) "x", weka di:

Rihnî (rohnî) (avista: raoxşna-)

Behir (par, perçe) (avista: baxdhra-).

Sihur (sor, sohr) (avista: suxra-)

Nîşank I. Navê mîriya "Botan" jî dikeve nav nîşeyên jorîn: Ew hîn di sedsala XVIIImîn de (di Şerefnamê de) bi awayê بختان, ku bê gûman "Bixtan" yan "Bextan" dihat xwendin û ku "x"ya wî paşê bi "h" nerm dibe, hatiye pejirandin (qebûl kirin); ew îcar bû "Bih-tan", "Buhtan". Ev bilêvkirin hîn jî di rojên me de, di welêt bixwe de, dúbare ye. Navê "Botan", ku bitenê li herderên din tê bi kar anîn, encama (netîce) hev-girtina tofa "-ih" bi "o" ye (li bend 74 binêre).

b) "Dh" yan "th", weka li jêr:

Reh (rê) (avista: Raithya-).

Pehin (av.: Pathana-).

Şehir (bajar) (av.: Xşathra-).

Bihin (av.: Baodhay-).



A KURDISH- ENGLISH DICTIONARY

TAUFIQ WAHBY

AND

C. J. EDMONDS



- c) "Ş", weka li jêr:
 Guh (avista: Gaoşa-).
 Tihî (tîbûn) (av.: Tarşna-).
 Çehiv (çav) (av.: Çaşman-).

Nîşank II. "H" di kurdî de dêlva ع yan ه, di gotinên ku ji erebî hatine stendin, xuya dibe.

Nîşe: Hinda (heta) (erebî: هند).
 Sinhet (sinet) (erebî: صنعة).
 Hinad (serhişkî) (erebî: عناد).

Nîşank III. Di dawiyê de, di vê merhela zimên de, "h"yek, weka dengdareke pêşîn di nêzîkî tevayiya gotinên îranî yan biyanî de, ku di rayê xwe de bi dengdarekê dest pê dikir, xuya dibe (li ser vê babetê, li bend 9 û 58 binêre).

2- Hilanîna "h".

Piraniya awayên ku di nîşeyên jorîn de hatin gotin îro bitenê weka şahid di hin peyvikên çiyayiyên ku gelek kevnan in (weka Botan, Behdînan, Hekarî) mane. Li hin cihên din, wan hema bicarek "h"ya xwe hunda kiriye, piştî hevgirtinên ku li dûrtir ewê bi hûrî (bi tefsîl) li wan bê nêrîn (bend 71-75). Bi rastî, piraniya mezin a peyvikên kurdiyên îroyîn ber bi hilanîna "h" jî sistema xwe ya dengdarî diçin. Ev deng hunda dibe:

- a) Bi hevgirtina xwe bi dengdêrên kurt re, di destpêk, hundir û dawiya gotinan de. Li dûrtir binêre, bend 71 û yên dû wê.
 b) Bi guhertina wê bi dengdareke din re

Nîşe: Paşdaniya "-ahî" dibe "ayî", "-atî". Dawîneya "-ihan" a rader dibe "-yan":

"Meyter" dêlva "mehter" (şagirdê ku li hespan dinêre).

"Diwêl" dêlva "dihêl" (dahol).

"Fênik" dêlva "hênik".

- c) Bitenê bi ketina wê:

Di destpêka gotinan de:

Nîşe: "Evor" dêlva "hevor" (nêriyê hov).

"Eş" dêlva "hêş".

"Evar" dêlva "hêvar".

"Ûr" dêlva "hûr".

"Aza" dêlva "haza".

"İser" dêlva "hîser" (kîler)

û hwd.

Di hundirê gotinan de:

Nîşe: "Dergevan" dêlva "dergehvan".

"Merov" dêlva "mehrov".

"Ewinde" dêlva "ewhinde" (ewqas)

"Rewan" dêlva "rehwan" (hespê ku di rêveçûna xwe de her du lingên eynî aliyê bi hev re radike).

Di dawiya gotinan de:

Nîşe: "Hevde" dêlva "hevdeh".

"Fire" dêlva "fireh".

"Derge" dêlva "dergeh" (nêzîk)

"Şe" dêlva "şeh".

Nîşank IV. "H" di ketina xwe de gelek caran dengdara kurt, ku tê paş yan pêş wê, bi xwe re dibe.

Nîşe: "We" dêlva "hewe" (awayê têrkerî yê pronavê "hon").

"Şîn" dêlva "heşîn".

53. **H- Ajotiya kerr.** Ev dengdar bi hêzanî di gotinên biyanîyên ku kurdî ew stendine xuya dibe. Ew weka Ç ya erebiya hinek nermkirî ye. Ew di hin gotinên ji rayê îranî jî, weka "hesp" (hesp), "heft" (heft), "tehil" (tehil), tê dîtin.

Bikaranîna "h", weka ya "H", pirr dúbare be jî ne bicarek giştî ye. Di zimanê nivîsînê de, ev dengdar piraniya caran bi "h" tê guhertin. Ji vê sedemê, awayên nivîsînê yên bêtirin: hesp, heft, tehil, in.

DIE MUNDART DER MUKRI-KURDEN

TEIL II 2A11053

DEUTSCHE ÜBERSETZUNG DER TEXTE
MIT EINER EINLEITUNG ÜBER INHALT UND FORM
DER OSTKURDISCHEN VOLKSEPIK

VON

OSKAR MANN



BERLIN

DRUCK UND VERLAG VON GEORG REIMER

1909

54. Weka gelên misilmanên din, Kurdan gelek gotinên erebî xistin nav zimanê xwe. Lê piraniya van gotinên biyanî pişavtineke (assîmilasyon) pîr xurt kişand. Sedema vê guhertinê nelihevhatina sîstema fonêtîka kurdî û ya gotinên samî ye. Lêhûrnêrîneke bilez (zû) ya guhertina ku kurmancî diçesibîne (ferz dike) dengdarên erebî balkêş e. Hin nîşe li jor hatin dayîn. En din ev in:

1- ت dibe "t" yan "s":

"Mîrat" yan "mîras" (ميراث)

"Sebat" yan "tebat" (ثبات)

"Sewab" (ثواب)

2- ح bêtirîn caran tê pejirandin, lê nermbûneke sivik distîne.

3- ذ dibe "z":

Lezet (لذة).

Zewq (ذوق).

4- Tîpên stûr ص, ط, ظ û "t", "s", û "z" tîpên bi lêv kirin. ض carna "z" û carna "d" dibe:

Zabit (ضابط).

Zerer (ضرر).

Erd (ارض).

5- ع guhertinên jêrîn dikişîne:

a) di destpêka gotinan de:

Eger piştî wê "elif" (a) bê, dibe "a"; eger ew bitenê bi "fetha" bilind bibe dibe "e" yan "h"; eger bi "kesra" nizm bibe dibe "hi", "i" û "î".

Nîşe: Adet (عادة).

Aqil (عقل).

Esker û hesker (عسكر).

Ezab û hezab (عذاب).

b) di hundirê gotinan de:

Ew kare bi "h" biguhere yan jî du dengdêran rastî hevdu bike û hunda bibe. O carna jî bi encama (netîce) hundabûna ع, dengdêreke kurt û hawsê (cîran) dirêj dibe.

Nîşe: دعو دibe dehwa, dehiw, dawa.

صنعة dibe sinhet, sanet.

طعم dibe tam.

Nîşank: Zaravên navçeyên ku li sînora veqetandina zimanî ya kurdî û erebî ne. ع dihêlin (naguherînin), lê wê nerm dikin.

c) di dawiya gotinan de:

ع kare yan bitenê hunda bibe, yan jî bi "h" bê guhertin.

Nîşe: Camî û camih (جامع).

Tima (temahkar) (طماع).

Rib (çarîk) (ربع).


6- (hemze) kare bi "y" bê guhertin yan jî bi awakî istisnâî du dengdaran ras tî hevdu bike û hunda bibe:

Xayîn yan xaîn (خائن).

Layîq yan laîq (لائق).

Qayîl yan qaîl (قائل).

Dûmahî heye



KURDISTANA TIRKIYE

Şerafettin KAYA

Di mêjuya (tarîx) 3 Hezîran 1986 de, Têkoşer şeveke agahdariyê li ser Kurdistanê Bakur (Kurdistanê Tirkîyê) pêk anî. Di vê şevê de, avukatê kurd, Şerafettin KAYA, hati bû vexwendin (ezimandin) û wî bi awakî fireh û giştî li ser dîroka Kurdistanê, sedemên bindestiya gelê kurd di dîrokê de, û bi taybetî li ser rewşa Kurdistanê Bakur a îroyîn axaft.

Ş. KAYA, di axaftina xwe de, li ser dij-wariyên ku Kurdistan, welatê bindest, parçekirî û mêtîngêh, dikişîne rawesta. Wî mercên pêşîn ên parçekirina Kurdistanê ji aliyê Osmanî û Safewîyan di mêjuya 1939 de, mercên paşîn ên parçebûna Kurdistanê û têkoşîna gelê kurd di hemberê mêtîngêhkarên de û awayê civaka kurdî bi awakî zanyarî (ilmî) ji guhdaran re gotin. Paşê, wî rewşa Kurdan û têkoşîna serxwebûnê piştî parçebûna Kurdistanê ya duwemîn di 1923 de rohnî kirin, û paş re bihurte rewşa Kurdistanê Bakur a îroyîn.

Di axaftina xwe de, Ş. KAYA bala guhdaran kişand ser rêzana dewleta Tirkîyê û bi awakî giring li ser idêolojiya dewletê, Kemalîzm, rawesta. Wî baş da xuya kirin ku amanca vê idêolojiyê ya pêşîn hundakirina çanda kurdî û imhakirina gelê kurd e. Ji bo ku bigihêje vê amancê, hikûmeta Tirkîyê kuştin û talankirinê bi kar tîne û bi awakî giring jî ber bi serketinê diçe. Eger gelê kurd li ber xwe nede û dêmokratên cihanê piştî wî negirin, ewê rewşa wî diwartir bibe.

Kemalîzm ewê bigihêje amanca xwe eger gelê kurd, di aliyê çandî de, di aliyê netewî de, di aliyê civakî de, ji holê rake û li ba gelê kurd jî ewê pirsê Ermenîyan bide ji bîr kirin. Nîşeyên (misal) rêzana (siyaset) dewleta Tirkîyê li ber çavên hemî cihanê ne û kes nikare wan inkar bike. Nijadkujiyên (qetliam) gelên kurd û ermenî û sirgûnên wan ku ji 70 salan û vir bêtir de dibin xuya ne.

Ş. KAYA bala guhdaran kişande ser rêzana

dewleta Tirkîyê di aliyê aborî de jî. Wî ev talana giran di hemî aliyê aborî de got û paş re bersivên pirsên guhdaran, bi hêzanî yê senatorê belçikî Walter Luyten, dan.

Lê bala guhdaran bi giranî ket ser axaftina wî ya ser zindananê Kurdistanê û bi taybetî li ser êşandinan (işkence) di girtîgeha Diyarbekrê de. Weka ku tê zanîn, Ş. KAYA jî di sala 1981 de hati bû girtin û heft heyv û nîv di zindana Diyarbekrê de hati bû êşandin. Wî ev êşandin di pirtûka xwe "Diyarbakir'da İşkence" de nivîsandine û Dengê Komal ev pirtûk çap kiri bû.

Avukat
Şerafettin Kaya

DIYARBAKIR'DA

İŞKENCE

Halk Yayınları

DARÊN KURDISTANÊ

Berhevkirin: YALÇIN

A. DARÊN HOV

- | | | |
|-----------------------|--------------------|--------------------|
| 1. Ajnû | 20. Darê Mera | 39. Sincirî |
| 2. Badar | 21. Darqez | 40. Sîfhirçi |
| 3. Behîfheşînuh | 22. Deyndar | 41. Sîftehlik |
| 4. Behîftahlik | 23. Ervist | 42. Soredar |
| 5. Belalûk (helhelûk) | 24. Gez | 43. Stîrî |
| 6. Ben | 25. Gûhûja sor | 44. Şîhînu |
| 7. Benav | 26. Gûhûja zer | 45. Tawî |
| 8. Benûşk | 27. Hêjîr | 46. Têwî |
| 9. Berû | 28. Karçîna beranî | 47. Tu |
| 10. Bihuk | 29. Keli | 48. Tureşik |
| 11. Bî | 30. Kenêr | 49. Tuşimî |
| 12. Bîreşik | 31. Kevot | 50. Tuqesp |
| 13. Bîşeng | 32. Mazî | 51. Tuzerik |
| 14. Bîzerik | 33. Parzî | 52. Zeytuna beranê |
| 15. Bîzu | 34. Pelk | 53. Zirgoz |
| 16. Çervûbî | 35. Qaç | 54. Zirsincî |
| 17. Çinar | 36. Qazqaz | 55. Zîzelaç |
| 18. Darê inap | 37. Rêrî | |
| 19. Darê bîneçs | 38. Rûr | |



B. D A R Ê N K U T Ê N Ç A N D I N

- | | | |
|-------------|---------------------|-------------------|
| 1. Alîsor | 15. Guzane | 29. Hilû sor |
| 2. Aqu | 16. Gûz | 30. Hilû zerik |
| 3. Bêluze | 17. Hesenî | 31. Himbeqî |
| 4. Bih | 18. Hewl | 32. Hinar |
| 5. Birdeq | 19. Hêjîr | 33. Îcaz |
| 6. Bitim | 20. Hêjîra behrastî | 34. Karçînveşik |
| 7. Dehlibî | 21. Hêjîra izraqî | 35. Karçînzerik |
| 8. Enatî | 22. Hêjîra reş | 36. Karçîna Ebasî |
| 9. Feqîrî | 23. Hêjîra şilyanî | 37. Kirkirû |
| 10. Fiskinî | 24. Hêjîra şingalî | 38. Kirar |
| 11. Fisteq | 25. Hêjîra zer | 39. Mezrûne |
| 12. Fişne | 26. Hilû | 40. Mêranî |
| 13. Gêlyaz | 27. Hilû ker | 41. Mêw |
| 14. Gul | 28. Hilû reşik | 42. Mêwa reş |



- | | | |
|--------------------|-----------------|-----------------|
| 43. Mêwa spî | 52. Sîvê tutikî | 61. Tûmanî |
| 44. Mêwa teyfî | 53. Sîvê xelatî | 62. Xuxa avî |
| 45. Mêwa zer | 54. Sîvşîrîn | 63. Xuxa milkîr |
| 46. Mijmijî | 55. Sîvtirşik | 64. Xurme |
| 47. Pirteqal | 56. Spîndar | 65. Zerzele |
| 48. Qitilnefs | 57. Şitu | 66. Zeytûn |
| 49. Sîhirçî | 58. Şîlan | 67. Zirspîndar |
| 50. Sîvbizrî | 59. Tortore | |
| 51. Sîvê kulundurî | 60. Tutirî | |

DÎROKA KURDISTANÊ DÎ

- V -

B. Dema îslamî heta 1920

NEXŞA ÊLÊN KURDÎ DI DEMA SILTANÊN MEMLÛK DE

Vegirtina (işgal) mogolî rola rêzanî (siyasî) ya êlên (eşîr) kurdî bicarek rakiri bû, lê li Misrê, ku tê de siltanên Memlûk planên veşartî dijî Ilxaniyan çêdikirin, çare-nûsa: (qeder) vî regezê (unsur) misilman gelek balkêş bû. "Masalik El-Absar" ya El-Umarî (749/1348) nîşan dide ku çiqas Kurd di wezaretên siltanên memlûk de baş hatibûn nasîn. Li gora vî nivîskarî, Kurd nêzîkî Iraq, Diyar El-Ereb, Sûriye û Yemenê hebûn. Çiyayê (El-Cibal) ku tê de Kurd rûdinên nêzîkî Hamadanê dest pê dike û li Kîlîkya (bilad El-Takfûr) diqede. Li Rojavaya Diclê Kurdên Cezîre û Mêrdînê qurbanên hemî hawsêyan (cîran) bûn; li gel vê qasê, li Mêrdînê, merivek bi navê Ibrahîm El-Ars-Babî (?) berê demeke kurt xwe serbixwe îlan kiri bû û hêzeke mezin stendi bû. Nivîskar lîsteke 20 êlên ku di navbera Hamadan û beşa Cezîrê ya navbera Mûsil û Kawar de dijiyan dide (li Kewar a Şerefname binêre).

1. Goranî, ku ji şerkar û cotkaran pêk bû bûn (cund wa-raiyya).
2. Gilalî (li çiyayê Galala, li ba Soraniyan, Şerefname, I, 286; Rich, Narrative, I, 123: Xellali, binêre). Beşek ji vê êlê çû Sûriyê. Mîrê wan Şeref El-Dîn di bin Mogolan de waliyê Erbîlê bû, lê ji aliyê Mogolekî hat kuştin.
3. Zangalî (= Zangana?).
4. Kûsa û Mabir (??), ên Şehrezorê, welatê xwe berda û çûn Sûriye û Misrê.
5. Sabûlî (Sutûnî?), di navbera Şehrezor û Uşnû de dijiyan. Nêzîkî wan Kartawî dijiyan. (? Hoffmann, Auszüge, rûpel 207).
6. Hasnasî (Xuşnawî?). Ew çend hezar bûn û di sê şaxan de hati bûn veqetandin. Yek ji van şaxan, ku li Karkar bi Kartawîyan (?) re rûdinişt, perê derbasbûnê


li Darbendî Karabolî distend (= riya Zabê Piçûk; li Hoffman, 263 binêre).

7. Nêzîkî Karhîn (=Kerkûk?), êleke ku ji 700 meriv pêk bû bû rûdinişt.
8. Êlek "di navbera her du çiyayên de" (beyn El-Cebeleyan), li ser zewiyê (erd) Erbîlê dijiya. Di zivistanê de, ew li çavdêriya (rehmet) Mogolan digeriya û di havînê de wê alîkariya êrîşên leşkerên misrî dikir.
9. Mazancan (?). Jimara wan 500 bû. Ew nêzîkî Erbîlê û li Mazancan, Nerwa û Bêxma (ev her du nahiyên dawîn li ser Zabê Mezin, li Rojhilata Akr, ava bû bûn) dijiyan. Serokên Mazancanan destelata (hikm) êla Humeydiyan (ji 1000 meriv pêk bû bû), ku merivên wan bûn, jî kir. Serokê Mazancanan ku jê re kak dihat gotin ji Ebbasiyan sernavê Mubariz El-Dîn stendi bû. Mogolan zewiyên wî di du perçan de pay kirin, lê kak nûnerê gel ê Erbîlê ma. Ketina wî ya katî (muweqet) di bin Arxun de hat dîtin, lê li gora Şubh El-A'ş'a, kur û neviyên wî zewiyên xwe (Akr û Şûx) ji xwe re hiştin.
10. Nêzîkî Tell-Haftûn zewiyê êla Sorî (Sorani), ku merivê wê pîr bûn, hebû.
11. Hawsêyên (cîran) wan Zarzarî ("zarokên zer") bûn. Ew jî xwediyên Malazgird (=Rûbarî Barazgird) û Rustak (beşa jêrîn a Şemdînan) bûn.
12. Cûlamergî, ji rayê (esl) Umewî, ji 3000 meriv ava bû bûn.
13. Kurdên qezayê Markawan (Margawar bixwîne) hevalbendên hawsêyên xwe, Cûlamergî û Zarzarî, bûn.
14. Nêzîkî Cûlamerg nahiya Gawar hebû.
15. Nêzîkî Cûlamerg, li aliyê Akr û Amadiya, nahiya Zibarî ku tê de 500 kes rûnişti bû hebû.

(*) Encyclopédie de l'Islam, 1981, Parîs. Wergerandin, fransîzî-kurdî: Pervîn.

16. Hekkarî li Amadiyê dijiyan û ji 4000 meriv pêk bû bûn.
17. Nêzîkî Hekkariyan, li aliyê Merc, çiyayê El-Amranî û şkefta Dawûd ku tê de Besît-kî (??) dijiyan hebûn.
18. Nêzîkî Cûlamerg, ber bi Mûsilê, Boxtî, nahezên Humeydiyan, dijiyan.
19. Dasinî pirr bûn, lê serokê wan Bedr El-Dîn peya bû cihên hêsantir û bitenê 1000 Dasinî li navçeya Mûsilê man. 500 Dasinî li Akr jiyan.
20. Dumbulî (?) li çiyayên bilind rûdiniştin

Şubh El-Aş'a xwe dispêre El-Tesqîf ku ji aliyê Teqî El-Dîn Ibn Nazir El-Ceyş hati bû nivîsîn (nêzîkî 748/1347) û lîsteke tevlihev a 25 mîrên kurd ên ku bi wan re pêwendiyên fermî (resmî) yên Qahirê hebûn radi-gihîne van zanînen Mesalik.



TÎMÛR O QRALIYETEN TIRKMEN

Piştî Mogolan, maliyên qralî yên nahezên Tirkmenan destelata xwe gihand Kurdistanê. Ev heyama (dem) ku hîn nuha jî baş ne hatiye nasîn ji bo Kurdan gelek giring bû. Maliyên qralî yên Kara Koyunlu û Ak Koyunlu ketin hundirê Kurdistanê, êlên kurdî kişandin nav şerrên rêzanî (siyasî) û olî (dînî) (li Shi'isme extrémiste des Kara-Koyunlu binêre) û bûn sedema tevgerên mezin ên xelkê: Di vê heyamê de, Kurdên Mukrî navçeya Başûrê gola Urmiyê stend (li Sawc-Bûlak binêre). Di vajayê (eks) wê de, vegirtina Tîmûr, ku bi awakî katî (muweqet) Kara Koyunluyan dûr kirin, bitenê demeke kurt ajot.

Gelek bûyerên ku di dîroka Hisn Kayfa û Cezîrê de, di navbera salên 796-897/1393-1491 de, çêbû bûn di dîroka sûrî de (li Haytam hati bûn nivîsîn) hatin nîşan dan û ji aliyê Behnsch (Rerum seculo XV in Mesopotamia gestarum liber, Breslau 1838) hatin weşandin.

Tîmûr di dema şerrên 796 û 803 de bi Kurdan re mijûr bû. Piştî ku ew li Begdad û Diyarbekrê geriya, wî ji nişka ve xwe avêt ser Cezîra ku hat tîk dan (xera kirin). Paşê, Tîmûr çiyayê ku Diyarbekrê ji Mûşê diveqetand buhurî û bi xweşî pêşwaziya mîr Şeref El-Dîn Bidlîsiyê ku "bi qencbûn û rastbûna

xwe li hemî Kurdistanê navdar bû" kir (bi tirkî: karşilamak). Di 803 de, Tîmûr ji Begdadê bi riya Şehrezorê vegeriya Azarbajcanê, û li ser vê riyê Kurdan êrîşî wî kir.

Piştî mirina Tîmûr, Kara Yûsuf Kara Koyunlu vegeriya Kurdistanê û di destpêkê de li ba Şems El-Dînê Bidlîsî pena bir (iltica kir), keça xwe da wî û bi alîkariya wî destelata xwe danî. Di 820 de, Kara Yûsuf bi nîşanekê zewiyên mîrên Bidlîsê tekîd kir. Dema ku, di 824/1421 de, lawê Tîmûr, Şahrûh, gihajt Ermenistanê, Şems El-Dînê Bidlîsî, Malik Muhammed Hekkarî, Malik Xelîl ê Hisn Kayfa, mîrên Xizan û hwd. silavan lê kirin. Kurdên Xoy jî ji waliyê Şahrux re canbêzar (fedakar) man (Matla' El-Sa'dan, Notices et extraits, XIV, 153).

Ak Koyunluyan (malbata qralî ya Bayandur), ku navenda wan a giringtirîn Diyarbekir bû, rêzaneke herdemî ya kuştina malbatên kurd ên mezin dajot (Şerefname, I, 164: Istîsal-i khanawadaha-yi Kurdistan) û bi hêzanî di dû êlên ku pirr nêzîkî Kara Koyunluyan bûn, weka êla mezin a Çamişgezdek, de diçûn. General Uzun Hasan, Sûfî Xelîl û Ereb Şah, Hekkarî vegirt, û piştî wan êla Dumbulî ku ji Botan hati bû wê bi awakî katî stend.

Hema ji 875/1470 (li Behnsch, berhem bixwe, 14 binêre), hemî Cezîre derbas bû destelata Ak Koyunluyên ku navê waliyê xwe kir Çelebî beg, ku Şerefname, I, 123, rewîstên (exlaq)

wî yên baş dipejirîne (qebûl dike). Generalê Ak Koyunlu, Suleyman Ibn Bizan, ji Bidlîsê Ibrahîm Xan ku paşe ji aliyê Ya'qûb, lawê Uzun Hasan, hat kuştin qewirand.

ŞAHÊN SAFAWÎ O SILTANÊN OSMANÎ

Şah Ismaîl, di destpêka şerrê xwe dijî Ak Koyunluyan de, Ermenistanê vegirti bû. Piştî şerrê Şarûr (907/1502), wî hemî welatê navbera Begdad û Maraş stend. Rêzana Ismaîlê lîmîn li hemberî Kurdan ji ya Ak Koyunluyan ne cihê bû. Weka evên dawîn, Şah xwe dispart êlên tirkmen, lê weka şîyekî ekstrêmîst (li XATA'Î binêre), ew hîn bêtir jî dijî Sunniyên kurd bû. Gava ku yazdeh serokên kurd hatin Xoy ji bo silavan li Ismaîl bikin, evê dawîn piraniya wan xist girtîgehê û di cihê wan de waliyine ku ji nav êlên Kizil Baş hati bûn bijartin teyîn kirin.

Ji vê demê, nêzîkî sê sedsalan, Kurdistan bû meydana şerrê siltanên osmanî û şahên Farisistanê. Şikestina Çaldîran (Çildêran) (1541) şelpeke (darbe) pîrr dijwar bû ji bo malbata qraliya farisiya nuh. Li gel serfiraziyên kurt ên paşhatiyên Şah Ismaîl, vegirtinên wan tucar qasî yên yekemîn ên Ismaîl ne bûn, û zewiyên farisî li Rojhilata Zagrosê hêdî hêdî hatin tewandin (helîyan). Xwestina Ismaîl ku waliyên faris ji

Kurdan re bide çespendin (ferz bike) dijî rêzana osmanî bû. Ev rêzan ji aliyê Hakim Idrîsê pîrr bijîr û ku bixwe Kurd bû dihat ajotin û amanca wê ew bû ku ji Kurdistanê re civakeke derebekî (fêodal) ku giranî bide reseniya (esalet) kurdî dabîn bike (temîn bike).

Şerrê Çildêran rewşê li Kurdistanê tev li hev kir. Mîrê ku Hisn Kayfa ji destê wê derket, Malik Xelîl (Şerefname, I, 155), Siirt ji nuh de stend û ber bi zewiyê xwe yê wirasî çû. Muhammed Begê Sasûn dijî Farisan şerr dikir. Ehmed Begê Mayyafarikîn, Qasim Begê Agîl, Cemşîd Begê Palû aliyê Osmaniyan girt. Waliyê Cezîrê di vegeandina Farisan ji Mûsilê de serfiraz bû. Seîd Beg Soran, Erbil û Kerkûkê stendi bûn. Canbêzariya nêzîkî bîst mîrên din ji bo Farisan pîrr kêmbû. Lê serdana xweyiyî (ziyareta şexsî) ya Idrîs ji hemî van 25 mîran re ew vegeandin destelata siltên. Gava ku Selîm çû Tebrîzê, Ismaîl alîkariyên leşkerî şandin Diyarbekir û Hisn Kayfa. Idrîs leşkerê alîkar (mîlîs) ê kurdî civand û Kurd Beg, waliyê faris ê Kurdistanê, şikand. Kurdên Diyarbekirê dijî êrîşkerên faris xwe ragirt (xwe parast), heta gihajtina alîkariya ku ji aliyê Biyikli Mehmed Paşa hati bû şandin. Biyikli û Idrîs xwe gihand Hisn Kayfa û Faris şikandin. Paşê, bi xurtkirina 5000 Kurd (ên Amadiya?), Tirkan Diyarbekirê rizgar kir û Mêrdînê, ku bitenê kela wê ji aliyê Farisan vegirtî ma, stend. Di vê navberê de, efserê (zabit) faris, Kara Xan, bi serfirazî çû aliyê Begdad û Kerkûkê. Rûniştevanên Mêrdînê, piştî qewirandina Kurdan, Faris wexwendin (dawet kirin) ku bajêr ji nuh de vegirin. Rasthatina her du leşkeran li ser riya Nuseybîn-Urfa çêbû. Faris hatin şikestin û Biyikli Suleyman Xan, ku hîn jî li Mêrdînê bû, neçar (mecbûr) kir ku xwe bide dest (teslîm bibe). Paşê, vegirtina Nuseybîn, Dara, Mayyafarikîn, Diyarbekir û Sincarê pêk bû, û Idrîs pêkanîna sazandî (idarî) ya Sancakan temam kir. Di wilayeta Diyarbekirê de, yazdeh sancak ji sazkerên tirk re hatin dayîn; di heşt sancakên kurdî de (Ekrad beyligi), waliyan destelatê bi awakî fermî da begên nuh. Lê, evên dawîn, hergav ji malbatê bixwe dihatin bijartin. Pênc hikûmetên wirasî (kurd hükümeti) malbatên xwe yên qralî, bi derbasbûna rast a destelatê ji bav bo law, parastin (li Tischendorf, Das lehnwesen in d. moslem.



Staaten, Leipzig 1872, fesi II û IV, li gora 'Ayn-i 'Alî Mü'edhdhinzade ku di destpêka sedsala XIÎmîn/XVIIÎmîn de dinivîsî binêre). Paşê, rêzaneke weha li hemî Kurdistanê, ji Malatyê heta Beyazîd û Şehrezorê, hat danîn (li jêr, li Şerefname û li zanînen gelek balkêş ên Ewliya Çelebî, IV, 176-80 û 271-316 binêre: Li ser 37 sancakên girêdayî Wanê, li gora zagona "qanûn" Suleymaniyê ya Îmîn û merasîmên birêveçûna leşkerê navçeyî). Bitenê wilayeta Kermaşahê ji Farisan re ma. Idrîs baş hat xelat kirin û fermanên teyînkirinê jê re hatin şandin. Di nav van fermanan de cihên vala hebûn ji bo ku ew karibe navên palêwrawan (kandîdat. Bi tirkî: Aday) tê de binivîse (Hammer, GOR 2, I, 749).

Di 936/1530 de, Şah Tahmasp ji nuh de Begdadê bi destê Zul Faqar, kurdek ji êla Mûslû (Mosullu?), vegirt. Şerrên dirêj dest pê kir: Suleyman leşker dijî Farisistanê, di 1533, 1534, 1535, 1548, 1553 û 1554 de, ajot. Bi vê hinceta (munasebet) dawîn, leşkerên Begdadê Kurdên Belkas û Şehrezorê bindest kirin û Faris li Gurcistanê mijûr bûn (Hammer, berhem bixwe, II, 236).

Bi aşîtiya 999/1590, Abbasê Îmîn diviya ji Tirkan re wilayetên rojhilatî, tevî Azarbaycan, Şehrezor û Lûristanê bihêle (berhem bixwe, II, 559), lê hema ji 1010/1601, şerr ji nuh de dest pê kir, û bi aşîtiya 1021/1612 Farisistan ji nuh de wilayetên ku hunda kiri bûn, ji derveyî (ji xeynî) Şehrezorê, stendin (berhem bixwe, II, 745). Şah Abbas 15.000 Kurd li ser sînora Xurasa-

nê sergûn kirin ji bo ku ew weka diwarekî dijî Tirkmenan bi kar bân.

Nêzîkî dawiya destelata Şah Abbas, Tirkan giraniya xwe da Begdadê. Di şerrê yekemîn ê Hafiz Paşa de (di 1623 de), di leşkerê wî de tofên (kom) Kurdistanê hebûn. Kurdan bi mîrxasî şerr dikir, lê Farisan, piştî dehdana êrişan, rêzên leşkerî yê sezadanê (cezakirinê) şandin heta Mêrdînê. Piştî mirina Şah Abbas, wezîrê mezin Xosrow Paşa, di 1039/1629 de, çû ser Begdadê. Seyyid Xanê Amadiyê, Mîra beg Soran û êla tevliheva kurdî-erebî ya Bacilan alî Xosrox Paşa dikir. Di vê demê bixwe de jî, Ehmed Xan Erdelan kêlêka tirkî haraşa (tehdîd) dikir. Xosrow Paşa ket heta Sineh û Hamadanê. Tirkan, di vegerê de, nêzîkî Çamçal û Dartang leşkerekî faris şikand. Li gel vê qasê, Begdad xwe ragirt, û dema ku Xosrow Paşa xwe kişand, Ehmed Xan Erdelan ji nuh de Şehrezorê vegirt (Hammer, berhem bixwe, III, 17, 23, 49, 86, 93). Bitenê di 1048/1638 de, Murad IV Begdadê bi awakî herdemî stend, û piştî salekê peyman bi Farisistanê re hat mor kirin (imza kirin). Ev peyman bû bingeha sînora tirkî-farisî heta sedsala XIXmîn (Na'ima, Tarîx, I, 686). Ji bo vê yekê jî, Farisistan vegehiya zincîra Zagrosê.

Ji sedema şerrê mezin di navbera Safawî û Osmanîyan de, Kurd têgihajtin giringiya xwe ya rêzanî (siyasî). Şerefname ji me re nexşa hûr a geşbûna jîna derebekî (fêodal) ya êl û mîriyên kurdî di nêzîkî 1005/1596 de hişt.

Dûmahî heye



ALĀKARIYA CIVAKA BIYANIYAN

Derwêş

- III -

RÊZANA DEWLETÊ YA BIYANIYAN

Hikûmeta Belçîka ta niha kêma agahdarî dane li ser cihê biyaniyan di nava civaka vî welatî de. Sedema wê ev e ku li vira biyanî ji bo demeke kurt dihatin dîtin û niha jî weha tên dîtin.

Di aliyê din de nifûsa biyaniyan (zêdebûna zarokan) mezintir dibe û agahdariyê dixwaze.

Ji biyaniyên Belçîka 40% li navçeya Wallonie, 27% li Flanderên û 27% li Bruksel dijîn. Ango, 12% ji tevayîya civaka Wallonie, 4% ji ya Flaman û 24% ji ya Bruksel, (li Belçîka 9% kes) biyanî ne.

Mayîna biyaniyan bê mînaqêşe ye û pêwîst e rêzana dewletê li ser vê rastiye biçe. Dijwariyên sazandî (idarî) û rêzanî (siyasî), ku integrasyona civaka biyanî zahmet dîkin divê rabin.

Bêdadiyên (neheqî) şaredariyan (belediye) di hemberê biyaniyan de divê rabin. Hin wezîr (nişe: R. Steyaert) "dixwazin" ji çend pirsên biyaniyan re çare bibînin. Lê ji ber ku pirsên biyaniyan bi awakî giştî û tev de nayên holê, daxwaz bi kêmasî dimîne û pirr tişt bi ser nakevin.

Di aliyê temîna civakî de divê dewlet mercên pêşvexistina alîkariyê çêbike. Herçend e xebatkarên vê sektorê hin çare ji hin pirsên biyaniyan re dibînin jî, ew nikarin biyaniyan ji mercên qels ên civakî û aborî (sosyo-ekonomik) xelas bikin. Çare ji hemî pirsan re bi awakî organîzekirî pêwîst e.

Cidabûnên çandî û yê pêwendiyê di navbera xebatkarên civakî û biyaniyan de tên zanîn (ew cidabûn ji ol, adet û hwd. tê). Divê dewlet vê yekê bide ber çavê xwe û rêzana xwe bike.

Nişe: di xwendegehan de nasîna civaka biyanî li Belçîka ji bo xwendekaran, ku li ba gelê xwe ewê ji bo biyaniyan jî kar bikin, giring e. Gihandina xortên biyanî di vî alî de cihekî vala dadigre.

Karên giring ku dewleta Belçîka ji bo biyaniyan (ji bo civakeke alternatîf!) divê bike ev in:

Rêorganizasyona:

- ketin û derketina Belçîka û mafê bicihbûnê.

- bazara kar.

- dibistan.

- alîkariya civakî.

- karê şaredariyan.

Di aliyê din de, divê ku Hikûmeta Navçeyî (Flanderên, Wallonie, Bruksel) rêzana bicihbûnê û karên sazandî bi awakî baş deynin ber xwe.

Karbidestên du navçên Belçîka (Flanderên û Wallonie) jî divê karê ku di bin destê wan de ye pêş ve bibin. Ew kar jî rêzana xweşiya civakî, rêzana saxiyê, rêzana çandê û rêzana întegrasyonê ye.

Li ba van tiştên jorîn, divê:

- alîkariya maddî ya rêxistinên civakî, ku ji bo întegrasyona biyaniyan kar dîkin, bibe.

- xurtkirina alîkariya komele û rêxistinên fêrkirina zimên.

- her rengê xebata ji bo xurtkirina peywendiyên civaka biyanî û civaka vira amade bibin.

- alîkariya maddî ji bo rêxistinên çandî û civakî yê her gelê biyanî ku li Belçîka ye. Ev alîkarî divê bi awakî baş, wekhevî û bê cidayî be.

Çi mixabe ye ku ta niha ji bo hemî xebata karê ji bo biyaniyan karbidestên navçeya Flanderên di sala 1985 de bitenê 26 milyon frenk amade kirin. Lê nêzikî 25 milyon frenk ji 26 milyon di navbera 6 rêxistinên ku ji bo biyaniyan kar dîkin hatin par kirin û 1 milyon frenk jî li + 50 rêxistin û komele hat belav kirin. Piraniya rêxistinên din jî frenkekî tenê wernegirt. Ev jî subjektîvîzma hikûmeta Belçîka di rêzana biyaniyan de dide xuya kirin.

Gava ku rêxistin û komelên çandî-civakî û demokratîk di xebata xwe de ji bo întegrasyonê, saxiyê, civakê, çandê û temîna xwendina zarokên biyanî û pêwendiyên her du civakên ji hev cida kar dîkin û ji bo wî karê dijwar tu alîkariya diravî û moral ji karbidestên dewletê nestînin nikarin jîna xwe berdewam bikin û piraniya caran jî ev rêxistin yan komele tên têk dan (xera dibin). Di vê rewşa ne xweş de, rêxistin û

komelên biyaniyan nikarin karekî hêja û dirêj deynin holê. Piraniya wan ji her alîkariya dewletê bêpar in.

Bi kurtayî, dewleta Belçîka biyanî ji bo karê xwe, ji bo pêşvebirina rewşa aborî ya xwe anîne vira û hînga wê ev civaka biyanî ji bo demeke kurt hesêb dikir. Lê niha, bê gûman hemî kes qebûl dike ku ew biyanî li vira bimînin û hew vedigerin welatên xwe (sedemên vê yekê pîrr in: rewşa aboriya qels, rewşa biyaniyên ku li vira dijîn dizanin ku bêkarî li welatên wan mezin e û ewê li wira bikevin nav aboreke qels û ne xweş. Alîkariya bêkaran, temîna îmkânên saxiyê û yên civakî û hwd. nabînin û nînin.

Di aliyê din de jî ew ji çend salan û vir de fêhrî jîna aza bûne û vê azadiyê li

welatên xwe nabînin.

Zarokên wan biyaniyên welatê xwe ne û ew zarok naxwazin herin wan welatan.

Pêwîst e dewlet, bi awakî objektîf li ser vê pîrsê raweste û vê rewşê biguherîne. Divê ew cidabûnên bingehtî di nav van civakên cida de ji ber çav dîr nexe û li ser vê yekê kar bike.

Kînga dewletê ev yek qebûl kir û ji bo çaredîtîne îmkân amade kirin ewê xuya bibe ku tiştêkî zahmet nîne. Lê eger ew vê rêzanê berdewam bike û bi rewşa biyaniyan mijûl nebe ewê pîrsên hê mezintir peyda bibin û hînga ewê xuya bibe ku dereng e.

Dawî

G u r o s o (*)

Mihdî

Rojek ji rojên biharê bû. Dinya xweş bû. Gundîyan karûbarên xwe dikirin. Komek ji leşkerên Tirk bi ser gundekî Kurd de girti bû. Wan malên gundîyan du bi du kontrol dikirin. Du leşker di mala Hiseynê Kor de li malê "qaçax" digeriyan. Hiseynê Kor û xuşka xwe li derê malê li hêviya derketina leşkerê di hindirû de bûn. Dilê wan dikire kute-kut. Xuşk ditirsiya û Hiseyn jî li diravên di nav livînê de veşartî bîr dikir (difikirî). Wî çar heyvan li xerîbiyê kar kiri bû û ew dirav anî bûn malê.

Paş ku cendirman gera xwe qedand û derketin, Hiseynê Kor bezî hindirû. Li nava livîna ku dirav tê de veşartî bû temaşe kir. Tiştêk xuya ne kir. Livîn bi hêrs avêt erdê. Vekir, lê mixabe, tiştêk di nav livînê de ne bû. Fîls ji diravan ne ma bû. Ji dahm de (di cih de), li devê derî xist û da pey cendirman. Bi berstika yekî ji wan girt û got: "Zû diravên min derxe". Cendirme bi tirkî: "Birak yakami lan, gebertirim yoks!". Hiseyn kînga diberde! Destê xwe hê bêhtir li qepira wî şidand. Bi hêrs: "Diravên min derxe, çawîş efendî".

Cendirmê din dît ku hevalê wî nikare xwe ji lepê Hiseynê Kor derxe, rahişte tivinga xwe û berê wê da Hiseynê Kor. Pê re jî qîrîn bi esker ket: "N'olmuş sana be! Birak o'nu yoksa eşek cennetine postalarım seni". Hiseyn ji xwe kêm ne kir. Bi hêrs: "Şildim bildim nizanım! Guroso diravên min dizîne. Diravên min derxin!".

Dikin nakin Hiseynê Kor berstika cendirme naberde. Wî lêdan qebûl dikir, lê berdana diravan ji cendirme re qet! Cendirme berê tivinga xwe da piyên Hiseyn û lingê wê kişand. Hiseynê Kor li erdê pelax (dirêj) bû. Xuşka wî kir hewar, lê çi fêde! Cendirme ye, dewlet e, qanûn e!

Hiseynê Kor li xuşka xwe nêrî: "Va tere-sa diravên min birin û çûn!". Xuşka Hiseyn li ber birîna piyên wî diket, lê dilê Hiseyn ji ber diravên çûyî dişewitî.

(*) Guroso: Merivê ku pora xwe kur kiriye. Gundî ji cendirman re guroso dibêjin.

Z I M A N Ê K U R D Î

- I -

Belavbûna cografî ya zaravên wî (*)

Fuad Hama XORŞÎD

P Ê Ş G O T I N

Hin pirtûk û gotarên ku li Iraqê derketine bi babeta zimanê kurdî mijûr bûn û jimarek ji rêwî (tûrîst) û rojhilatzanên welatên cihê jî bi vî yan bi wî awayî vê babetê darîçav kir. Loma, li ba me tofeke (kom) dîtinên nelihevhatî li ser rayê (esl) vî zimanî û jimara zaravên wî yên navçeyî çêbûn. Ev yek li ba xwendevanê ku ji rastbûna rayê vî zimanî û ji pêşveçûna wî ya dîrokî ne haydar e tevliheviyeke ramanî (fikrî) çêdike.

Loma, ev lêgerîn bi hinek destnîşandan û destpêkirin bi lêhûrnêrîna babeta zimanê kurdî mijûr dibe: Ji aliyê girêdana wî ya zimanî û belavbûna zaravên wî yên navçeyî, li gora rastiyên ku me karî bû ji kaniyên ku ketin destê me bicivînin û berhevkirina hin zanînan li ser wî bi riya lêhûrnêrîna meydani li hin navçeyan.

Ev lêhûrnêrîn tecrube dike ku bersiveke mantiqî bide dîtinên çewt, yên ku hin kanî di babeta girêdana vî zimanî û beşên zaravên wî de got. Û wê hin sedemên veşartî yên beşbûna van zaravan nîşan dan û piştire ew bi awakî cografîyekî heyamî (ê vê demê) belav kirin û nexşeke wan ya vekirî çêkir.

Hêviya nivîskar ew e ku ev lêgerîn alîkarî bike ji bo, ji alîkî, avakirina ramanê vekirî û rast li ser girêdana vî

zimanî û pêwendiyên wî bi zimanên hindî-ewrupî re, û ji alîkî din jî li ser zaravên wî yên navçeyî û belavbûna wan ya cografî, ne bitenê li ba xwendevanê kurd, lê li ba hemî baldayên lêhûrnêrîn û babetên wusa ji zarokên gelê me yê iraqî, tevî Ereb û Kurd û hindikayiyên wî yên din.

Kurtenivîsa vê lêgerînê di kovara Akademiya Zaniyariya Kurdî, Cild III, hejmar 2, 1975 de hat weşandin. Û beşa wê ya yekemîn a li ser zimanê kurdî di rojname Iraq de, hejmar 366, di 9.5.1977 de, û kurtenivîsa ya duyemîn a li ser zaravan di vê rojnamê bixwe de, hejmar 1620, di 10.6.1981 de hatin weşandin.

Di vê lêgerînê de gelek rastkirin, vekirin û nîşankên nuh hene. Mebest (meqsed) ji wan ev e ku em ramanê nêzîktirî rastiyê li ser babetên ku me li jor gotin û ku em hêvî dikin ku bala mutexassis û xwendevanan bi awakî wekhev bikişîne bidin.

Begdad, 6.9.1981

Fuad Hama XORŞÎD

B E Ş A Y E K E M Î N

Z I M A N Ê K U R D Î

Dema ku lêger lêhûrnêrînekê li ser rayê zimanê kurdî û zaravên wî çêdike, ew rastî dîtinên jimareke ne kêma ya rêwî û rojhilatzanan, ku bi awakî çewt û bê spartina tu bingeh û mantiqeke zaniyarî hatine gotin,

dibe. Destnîşandana xweyiya (şexsiyet) serbixwe ya her zimanekî, berê hertiştî, pêkanîna gelek lêgerîn, lêhûrnêrîn û pîvanên (muqayese) hûr pêwist dike, ji bo ku meriv wî vegeerîne rayên wî yên dîrokiyên

(*) Çapxana El-Wisam, Begdad, 1983. Wergerandin, erebî-kurdî: Pervîn.

kevn. Lê, meriv bitenê bi nêzîkbûna hin gotinên zimanên hawsê (cîran) xwe têr bike ji bo ku biryar bistîne ku ev ziman bitenê yek ji zaravên zimanê hawsê ye yan beşek jê ye, ev tiştêkî dirodalsa (mubalaşa) û bê rehberên zanîyarî ye.

Bi vî awayî, zimanê kurdî, ne weka ku hin rêwî û nivîskarên ku ew ne xwendiyê û nizanin bîr dikin (difikirin), zaravekî tevlihev û çewt ê zimanê farisî ye û ne yek ji peyvikên farisî yên ku ne rêziman û ne rêzîkên wê hene ye (1) û ew ne zimanekî ji rayê hindî ye jî (2).

Hemî ev dîtî, weka ku lêhûrnêrînen nuh isbat kir, ji rastiyê dûr in (3). Rast e ku zimanê kurdî ji derve weka her du zimanên pehlewî û farisiya nuh, ji aliyê cihêti û pêşveçûna wan ji zimanê avista, xuya dibe. Lê kurdî xweyîya (şexsiyet) wî ya serbixwe, weka zimanekî, heye (4).


Sedemên ku ev kes ajotin dîtina wan ya çewt li ser girêdana zimanê kurdî yan rayê wî, ji alîkî kêmbûna weşan û berhemên bêjeyî (eserên edebî) yên ku bi zimanê kurdî hatine nivîsîn, bi hêzanî di dawîya sedsala nozdemîn û destpêka ya bîstemîn de, yên ku ji wan re pêwîst bûn ji bo pêkanîna lêhûrnêrîna û bihevpevînanan li ser vê babetê, û ji alîkî din jî pîrbûna zaravên kurdî ye. Ev her du sedem carna ji biyaniyê ku tecrube dike ku vî zimanî weka tevayiyekê nas bike zoriyên mezin derdixînin (5). Û bi ser de jî, ew dihêlin ku dîtineke ne hûr li ser girêdana wî bê dayîn.

Piraniya rojhilatzanan di lêhûrnêrînen xwe de bêtir bawer dikin ku zimanê kurdî tu girêdana wî (weka zarav yan şax) bi zimanê farisî tu neye, lê ku ew zimanekî ku xwediyê taybetiyên (xusûsiyet) serbixwe ye. Ji van rojhilatzanan em bi hêzanî Justi û Socin (6) darîçav dikin.

Rojhilatzanê yekemîn dilniya (tekîd) dike ku zimanê kurdî ne şaxeke hilweşayî ji zimanê farisîyê nuh e, lê ew ji farisî, ji aliyê rêzîka wî ya dengî û veqetandinî, gelek cihê ye.

Socin jî nîşan da ku zimanê kurdî ne zaravekî bira yê zimanê pehlewî û farisîyê nuh e, lê ku di pêwendiya ku di navbera wan de ye tiştêkî dûrtir heye. Bi ser de jî, Socin nîşan da ku zimanê kurdî ne şaxek ji zimanê farisîyê kevn e.

Rast e ku di navbera zimanê kurdî û zimanê farisî de pêwendiyêke dûr heye, ji bo ku her du jî girêdayî tofa (kom) zimanên hindî-ewrupî ne, lê ew ji gelek aliyan, eger ji yê gotin yan rêziman yan kesandin yan bilêvkirinê be, ji hevdu cihê nê (7).



- (1) Weka nîşe binêre: Lauard, Austen H., (Discoveries among the ruins of Nineveh and Babylon, with Travels in Armenia, Kurdistan, and Desert), New York, 1853, p. 374.
Driver, G.R., (studies in Kurdish History), B.S.O.S., 1922, Vol.11, part III, pp. 493-505.
- (2) Creagh, James, (Armenians, Koords, and Turks), London, 1880, p. 170.
- (3) Soan, E.B., (Notes on the phonology of Southern Kurdish), J. R.A.S., 1922, part II, p.192.
- (4) Edmonds, c.j., (The place of the Kurds in the Middle Eastern Scene), R.C.A.J., 1958, Vol. XIV, part II, p.147.
- (5) Noel, Edwards. (The character of the Kurds as illustrated by their proverbs and popular saying), B.S.O.S., Vol. 1, part IV, 1920, p. 79.
- (6) 1. Justi, (Kurdische Grammatic), SPB, 1880.
2. Socin, (Die spacheder Kurden), in grundris der Iranischen philologie, 1-2 Strassburg, 1898-1901.
- (7) Edmonds, C.J., (Kurds, Turks and Arabs), London, 1957, p. 7.


Zimanê kurdî, weka ku Sidney Smith dilniya kir, zimanekî bicarek serbixwe ye û pêşveçûnên wî yên dîrokiyên rast hene (8). Ew zimanekî ariyekî gelek hêja ye û ji demên kevnar heta roja me li çiyayên Kurdistanê bi awakî zelal û tekûz dijî (9).

Ji bo ku em rêzayê (mana) zimanî yê tofa zimanên hindî-ewrupî û pêwendiya zimanê kurdî bi van zimanan re baş nas bikin, divê em hin rastiyên dîrokî bînin bîran. Arkêologan (ên ku erdê dikolin ku şûnpeyan derxînin) bala xwe da ku rengdêreke (sifet) hevrayî ya şareyariyeke (medeniyet) miroviyeke kevn, ku piştî qedana heyama kevirîya nuh li ser aqareke pîr fireh ji zewiyên (erd) cihana kevn, weka Rûmanya, Başûrê Rûsya, Sûs, Belûcistan, Hindistan, Tirkmenistan û Kurdistan, belav bû bû heye. Bi encama (netîce) vê yekê, zana gihajtin gotina ku bê gûman ev şareyariya wekhev divê ji aliyê gelekî tenê hatibe ava kirin. Û ji bo ku nîşanên vê şareyariyê ji Hindistanê heta Ewropa belav bû bûn, ew li hev hatin ku navê wî gelî bikin hindî-ewrupî (10).

Ev gel ji êlên cihê yên ku berê barkirin û belavbûna xwe li welatê xwe yê kevn ê ku li deştên ku ber bi Rojhilat û Rojhilata Bakurê Deryayê Qezwînê dirêj dibû rûdiniştin ava bû bû (11). Ji bo ku tevayiya van êlan (eşîr) gelekî tenê ava dikir, ew hema zimanekî tenê, ku jê re navê zimanê hindî-ewrupî hat dayîn û ku îro jê hemî zimanên ku gelên arî dipeyivin derketin (12), dipeyivin.

Zimanê hindî-ewrupî jî (13), ku zimanê kurdî yek ji şaxên wî tê hesab kirin, ji zimanekî pêşdîrokî, ku mutexessisan navê wî dikin zimanê hindi-ewrupiyê hov (bidaî) û ku hest (texmîn) dikin ku ew 5000 sal berê İsa (mîladê) hebû (14), pêş ve çû.

Ev ziman bi barkirinên gelên hindî-



ewrupî, yên ku her tofek ji wan berê xwe da navçeyek ji navçeyên cihana kevn, bi hêzanî li Asya û Ewropa, belav bû. Beşek ji wan ji çemê Danûb buhurî nîvgirava Balkan û Ewropa Rojhilatî. Ev jî bapîrên Yûnan, Roman û gelên dinên ewrupî yên ku bi zimanên ewrupiyên îroyîn dipeyivin in. Beşeke din ji wan berê xwe da Rojhilata Başûr, gihajt sînorên Hindistanê û li Sind û Pencab bi cih bû. Ev gel Ariyên Başûrê Asya ne û ew in ku îro bi zimanên hindî, ku li Başûrê Asya ji tofa zimanên hindî-ewrupî ne, dipeyivin.

Beşa siyemîn jî berê xwe da Asya Piçûk û

- (8) Zekî, Muhammed Emîn, (Xulasat Tarîx El-Kurd we Kurdistan) T2, Begdad, HI, Begdad, 1961, r. 65-305.
- (9) Soan, E.B., (Report on the Sulaimani District of Kurdistan), Calcutta, 1918, p.85.
- (10) Charpentier, Jarl, (The original Home of Indo-Europeans, B.S.O.S., Vol. IC, 1926-28, p.149.
- (11) Brasted James Henri, (Tarîx El-'Usûr El-Qedîme), wergerandina Dawûd Qurban, Beyrût, 1926, rûpel 135. Û li Charpentier, Jarl, berhem bixwe, r. 164, binêre.
- (12) Gotina Arî bi çewtî hatiye bi kar anîn, ji bo nîşandana pêşiyên gelê hindî-ewrupî. Bi rastî, gotina Arî ji navê yûnaniyê ku ji mersefa Iranê, ku ji çiyayên Zagrosê li Rojavayê heta çemê Sind li Rojhilatê dirêj dibe, re hati bû dayîn hatiye stendin. Wê çaxê, ev navçe bi navê Aryana - ku jê navê İrana îroyîn hat stendin - hati bû nasîn. Li Brasted, James Henri, berhem bixwe, rûpel 135 binêre.
- (13) Tê gotin ku dozîneweya (dîtin) yekemîn a rengdêrên (sifet) hevrayî ya tofa zimanên hindî-ewrupî ya zimanzanê alman Franz Bop (1791-1867) e. Li Charpentier, Jarl, berhem bixwe, rûpel 164 binêre.
- (14) Moris, Williams, (The Heritage illustrated dictionary of the English Language), New York, 1973.

çiyayên Zagrosê û li Iran û Kurdistanê belav bû. Di pêşiya yê ku hatin çiyayên Zagrosê de Kûtî, û paşê Med (15), bapîrên gelê kurd (16), hebûn. Û Partan jî berê xwe da Bakurê Îranê û Farisan Başûrê wê. Ev perça Îranê heta nuha bi navê awheyayê (iklîm) Farisistan hatiye nasîn. Hemî tofeke zimanên ku hin taybetiyên zimaniyên wan nêzîkî hev bûn, û ku jê re wûşeya (istilah) tofa zimanên îranî hat dayîn (17) dipeyivîn. Ev tof, weka ku di nexşe N° 2 de bi hûrî (bi tefsîl) hatiye nîşan dan, şaxek ji zimanên hindî-ewrupî ye.

Li ser vê bingehê, zimanê hindî-ewrupî îro tofine zimaniyê bingehî û şaxî, li her du kertên (kite) Asya û Ewropa, himêz dike. Ev jî ev in:

1. Tofa hindî-îranî.
2. Tofa anadolî.
3. Tofa îtalî.
4. Tofa jermanî.
5. Tofa seltî.
6. Tofa baltîkî-slavî.

Û hin zimanên dinên ku meriv kare li wan di nexşe N° 1 de baş binêre.

Ev tofên zimanî bixwe jî di çend ziman yan tofên zimaniyên şaxî, ku hemî zimanên hindî-ewrupiyên îroyîn himêz dikin, de diveqetin. Ango, tofa hindî-ewrupî di 4 tofên zimaniyên şaxî de diveqetin. Ev jî ev in:

1- Derdî. 2- Hindî. 3- Qezwînî (bi navê Deryayê Qezwînê). 4- Îranî.

Û tofa zimaniya îranî gelek zimanan himêz dike:

1- Kurdî. 2- Belûcî. 3- Sugdîyanî. 4- Beştû
5- Avista. 6- Farisiya kevn (li nexşe 2 binêre).

Balkêş bû ku di nav tofên hindî û îranî de nêzîkayîyeke vekirî hebû. Ev yek peyabûna wan ji tofeke tenê, ku jê re wûşeya zimanê hindî-îranî hat dayîn û ku tê bawer kirin ku ew rayê ku jê tofên zimanên hindî û îraniyên îroyîn derketin e, nîşan da.


Lê tofa zimaniya îraniya ku her du zimanên kurdî û farisî û yê dinên ku hatin gotin girêdayî wê ne di nav 3 şaxên bingehî de diveqetin:

1. Zimanên îranî yê Rojavaya Bakur.
2. Zimanên îranî yê Rojavaya Başûr.
3. Zimanên îranî yê Rojhilatê.

Zimanê kurdî girêdayî tofa yekemîn e, lê yê farisî girêdayî tofa duyemîn e (18). Ev jî serxwebûna her yek ji wan nîşan dide. Û weka ku cardin di nexşe (2) de xuya dibe, zimanê kurdî zimanekî serbixwe ye û ne şaxek yan zaravekî navçeyiyekî ji zimanê farisî veqetayî ye. Nexşe zayenda (sifet) pêwendîya rast a nav her du zimanan û ku li ser bingeha girêdana wan bi tofa zimanên îranî rawestiye nîşan dide.

Bi vî awayî, ji hemî tiştên ku hatin gotin em baş dibînin ku zimanê kurdî zimanekî serbixwe ye û ku ji aliyê pêşveçûna xwe a dîrokî ew xwediyê serxwebûneke vekirî ye. Ev serxwebûn jê re xweyiya (şexsiyet) wî ya zimaniya ku wî ji zimanên dinên îranî cihê dike dide, ji bo ku ew zimanekî resen (esîl) e û ku di riya pêşveçûna xwe de, di dirêjajiyê sedsalên cihê de, bi awakî bicarek ji farisî serbixwe, çûye (19).

Dûmahî heye



(15) Di babeta barkirina Medan bo çiyayên Zagrosê de binêre: Yong, T. Cyter, (The Iranian Migration into Zagros), IRAN, Vol. V, 1967, p. 12-17.

(16) Edmonds, C.J., berhem bixwe, rûpel 7.

(17) Ji gotina (zimanên îranî) divê neyê têgihajtin ku ew hemî zimanên ku li hundirê Komara Îrana îroyîn tên bi kar anîn in. Lê, zimanên îranî navekî ku ji tofeke mezin a zimanên ku derketine derveyî sînorên vê dewletê re hatiye dayîn. Loma, li her derê vê pirtûkê, ev gotin tofa zimaniya jorîn nîşan dide û tu pêwendîya wê bi îranê re, weka dewlet, tu neye. Lê, hin zimanên ku li Îrana îroyîn tên peyivîn beşek ji vê maliya zimanî ne.

(18) Edmonds, C.J., (The place), berhem bixwe, r. 147.

(19) Soan, E.B., (Grammar of the Kurdish Language), London, 1913.

XEBATA ME

21 ADAR

Em beşdar bûn şeva agahdariyê li ser Nijad-parêziyê, ku ji aliyê rêxistina M.R.A.X. hati bû pêk anîn.

22 ADAR

Newroza Xwendekarên Îranî. Em bi muzîk û stranên kurdî beşdar bûn.

30 ADAR

Newroza Komkar li Den-Haag, Hollanda. Me pirtûk û kasetên kurdî raxistin.

18 NÎSAN

Bi hinceta (munasebet) Sala Aşîtiyê, rêxistina Dialogue International şevê li Bouge nêzîkî bajarê Namur, pêk anî. Em, tevî Zeyno, bi muzîk û stranên kurdî, û bi raxistina pirtûkan beşdar bûn.

19 NÎSAN

Şeva rêxistina Oxfam-Wereldwinkel, li Overpelt: Em cardin tevî Zeyno, bi muzîk û stranên, û bi raxistina pirtûkan beşdar bûn.

21 NÎSAN

Rêxistina Sociaal-Kulturele Raad St-Joost, bi alîkariya Têkoşer, şeveke piçûk ji bo rûniştvanên şaredariya (belediye) St-Joost li ser Kurdan, pêk anî: Sê endamên Têkoşer bi sê zimanan: Kurdî, fransîzî û flamanî (hollandî) pirsra Kurdistanê da nasîn û paşê me filmeke vidêo li ser Kurdistanê Iraqê nîşan da. Piştî xwarinê, herkes ket dîlanê. Bi ser de jî, me pirtûk û kasetên kurdî raxistin.

22 NÎSAN

Piştî gelek civînên mehane bi Universitê de Paix (Zanîngeha Aşîtiyê) û rêxistinên dinên navdar re, li ser mafên mirov û gelan, me civîneke çapê li I.P.C., li Bruxelles, pêk anî ji bo ku em bingeh û bernama xebatê ji ramana tevane (xelk) re bidin nasîn. Di vê civînê de, Pr. F. Rigaux, serokê Zanîngeha Aşîtiyê û serokê Rêxistina Mafên Gelan, Pr. Bossuyt ku alîkarê serokê komisyona mafên mirovî li O.N.U. (Netewên Yekbûyî) ye, û serokê Mêdyatêka Wezareta Çandê peyivîn. Me jî çend pirsan ji Pr. Bossuyt li ser pirsra Kurdistanê li O.N.U. pirsîn.

26 NÎSAN

Cêjna Yekê Gulanê ya P.O.S. (Partiya Sosya-

lîst a Karkeran): Em bi raxistina pirtûk û kasetên kurdî beşdar bûn.

1 GULAN

Cêjna P.C.B. (Partiya Komunîst a Belçîka): Em bi raxistina pirtûk û kasetan beşdar bûn

1 GULAN

Cêjna Parti du Travail (Partiya Kar): Me pirtûk û kasetan raxistin.

20 GÛLAN

Civîna çapê ya rêxistinên belçkîyên navdar: MRAX, CNAPD, Commission Européenne Immigrée...., li ser mafê helbijartinan li şaredariyan ji bo biyaniyan. Bi vê hincetê, berpirsiyarekî yûnanî ji Hollanda hat û agahdariyeke gelek hêja û balkêş li ser stendina vî mafê giring li Hollanda da me.

31 GULAN

Em beşdar bûn xwepêşandina (meşîn) mezin dijî rêzana aborî ya hikûmeta Belçîka, ku ji aliyê sendikan hati bû pêk anîn.

31 GULAN

Festivala Biyaniyan li bajarê Antwerpen (Anvers): Em bi rêxistina pirtûk û kasetên kurdî beşdar bûn.

3 HEZÎRAN

Şeva Têkoşer a agahdariyê, li ser Kurdistanê Tirkîyê, li Bruxelles, li salona Botanique ya Wezareta Çanda Fransîzî. Avkatê kurd, Şerafettin KAYA, axaftineke gelek hêja li ser dîrok û rewşa Kurdistanê ya buhurî û ya Kurdistanê Tirkîyê ya îroyîn kir û bersiva pirsan da (li rûpel 9 binêre) Ji alîkî din jî, me pirtûk û kasetên kurdî raxistin, muzîka kurdî da nasîn û xwarin pêşkeş kir.

* * * *

DI MEHE DE CAREKE

- Civîn bi Zanîngeha Aşîtiyê û rêxistinên din re, li ser mafên mirov û gelan.
- Civîn bi komelên civakî û çandî, ku li şaredariya St-Josse, li Bruxelles, dixebitin re.

DI HEFTÊ DE CAREKE

Radyoya azad: Her yekşem, ji katjimêr (seet) 13 heta 15.

21 MART

M.R.A.X. tarafından ırkçılık üzerine düzenlenen geceye katıldık.

22 MART

İranlı öğrencilerin düzenlediği Newroz'a müzik grubumuzla katıldık.

30 MART

Komkar'ın Den-Haag, Hollanda Newroz bayramına kitap ve müzik, kaset sergisiyle katıldık.

18 NİSAN

Dialogue International Barış Yılı münasebetiyle Namur'a yakın Bouge'da bir gece düzenledi. Ses sanatçısı Zeyno'nun eşliğinde müzik ve kitap sergisi ile katıldık.

19 NİSAN

Oxfam-Wereldwinkel'in Overpelt'te düzenlediği dayanışma gecesine yine Zeyno eşliğinde müzik ve kitap sergimizle katıldık.

21 NİSAN

Sociaal Kultureel Raad St. Joost'un Tekoşer ile beraber St.Joost belediyesi sakinleri için Kürtler üzerine bir gece düzenledi. Tekoşer'den üç arkadaş Kürdistan sorununu üç dilde(Fransızca-Flamanca-Kürtçe) anlattılar. Konuşmadan sonra Irak Kürdistan'ı üzerine belgesel bir video - film gösterildi.Yemek, halk oyunları, kitap ve kaset sergisi,müzik ve hoş bir sohbet ile gecemiz sonuçlandı.

22 NİSAN

Université de Paix (Barış Üniversitesi) ve diğer tanınmış örgütler ile beraber yapılan aylık toplantılardan sonra Brüksel'de I.P.C Merkezinde bir basın toplantısı düzenlendi. Basın toplantısının amacı çalışma programımızı halka tanıtmak idi. Toplantıda Prof.F. Rigaux, Barış Üniversitesi, Halkların Haklarını Savunma Örgütü ve Birleşmiş Milletler İnsan Hakları Komisyonu Başkan yardımcısı Prof. Dossuyt ve Kültür Bakanlığının medyatek bölümü başkanı birer konuşma yaptılar. Biz, Birleşmiş Milletlerde Kürdistan sorununun durumunu sorduk ve gündeme getirdik.

26 NİSAN

Sosyalist İşçi Partisinin (POS) 1 Mayıs İşçi Bayramına kitap ve kaset sergisiyle katıldık.

1 MAYIS

Belçika Komünist Partisi(PCB)nin 1 Mayıs Bayramında kitap ve kaset sergimizi açtık.

1 MAYIS

Belçika Emek Partisi(PTB)nin 1 Mayıs Bayramında kitap ve kaset sergimizle katıldık.

20 MAYIS

MRAX, CNAPD, Commission Européenne Immigré gibi tanınmış örgütler göçmenlerin belediye seçimlerinde oy hakkı için basın toplantısı yaptılar. Basın toplantısına Hollanda'dan Yunanlı bir misafir konuşmacı davetliydi. Yunanlı konuşmacı Hollanda'da oy hakkının kazanılmasıyla ilgili çekici bir konuşma yaptı.

31 MAYIS

Sendikaların düzenlediği Belçika hükümetinin ekonomik politikasını protesto yürüyüşüne katıldık.

31 MAYIS

Antwerpen (Anvers) yabancılar festivaline kitap ve kaset sergimizle katıldık.

3 HAZİRAN

Tekoşer, Türkiye Kürdistan'ı konulu bir semineri Fransız Kültür Bakanlığının Brüksel Botanique salonunda düzenledi. Kürt Avukat Şerafettin KAYA, Kürdistan tarihi ve Türkiye Kürdistanının bugünkü durumu hakkında değerli ve ilgi çekici bir konuşma yaptı. Dinleyicilerin sorularına da cevap verdi. Aynı gecede kitap ve kaset sergisi açılarak kürt müziği tanıtıldı.

AYDA BİR

Barış Üniversitesi ve diğer örgütlerle insan ve halkların hakları üzerine toplantı.

St.Josse(Brüksel)belediyesi dahilinde sosyal ve kültürel örgütler ile toplantı.

HAFTADA BİR

Bağımsız radyo programı: Her pazar saat 13 ile 15 arası kürtçe programı dört dilde yapılmaktadır.

KURDISTAN DE TURQUIE

ŞERAFETTİN KAYA (AVOCAT KURDE)

INFORMATION - DEBAT

MARDI - 3.6.1986 - 19 h

LE BOTANIQUE

236, rue Royale - 1030 Bxl



Stand d'information et buffet kurde

Entrée : 100 F.B. _____

ORGANISATEUR : TÊKOŞER